

Rapora salane Rêz û silav ji hemî beşdarên re! Mamosteyên hêja.....!

Ev rapor di civata salane ya yekem a piştî damezrandina saziya fêrkirin û parastina zimanê Kurdî li Sûriyê de hate xwendin.

Berî hertiştî em neçar in van pirsan tim û tim bi bîra xwe bînin , pîrsa hebûna gelê Kurd û rola zimanê kurdî di wê hebûnê de @....Rewşa ku, gelê Kurd tê de dijî çawa û di kîjan pile û asteyê de ye @....Çi pîlan ji nebûna wî re tene gerandin @....Çekên berxwedanê ji bo hebûnê li ba Kurdan çî ne @....Giringiya parastin û fêrkirina zimên pileya çendê distîne @....Ji zimanê kurdî kîjan zarava , Kurmancî, Soranî , lê, zazakî @....Lê, na ne ev û ne ewJi dêvla yên kurdî , ne xeme em berê xwe bidin zimanên serdestan Erebi, Farisî , Turkî @.... Hêviya me ji vê pêşgotinê ewe Ku, em pêçana zimên ji nû ve vekin û giringiya parastin û fêrkirina ziman. kurdî bînin bîra hevdû , û bi hev re li bersivên wan pirsan bigerin. Ji ber ku, em di cîhaneke tijî çandeyên curbecur û têkel de dijîn û hemî jî bi hev re , li deriyê mejiyê me didin û dixwazin vê re di têkildariyê kevin û biguhêrin. Vêca, pêwîste ku, çawa em dê li hember yên dixwazin kesayetiya me ya netewî tune bikin rawestin@.

Hevdema ku, Kurd tê de dijîn , ji hemî aliyên ve , hevdema şûndamayîne ye . Li rex wê , em jaliyê zefîkarên welatê me ve bindestin jî . Vê rewşa kambax û kirêt , nehişt ne civak , ne hiş û ne jî aboriya me pêş ve here. Wêlomê jî , em bi dû qalîqê Pêşketinê dikevin û naveroka wê jî davêjin alîkî .Wek nimûne , em ji demokrasîyê hezdikin , lê , em nikanin demokras bin , em pîr tiştên baş di peyvkirinê de bi kar tînin lê... di karanîne de , bi kar nînin. Yanê. em pîr gototin , lê, kêr kirde ne. Di rewşeke weha de, em çiqas bi wekhevî , demokrasî , dadmendî[aşî û mafên

mirovan bang bikin ; têkeliya Erebi, Faris û Tirkan bi Kurdan re , wê wek yê Alman , Firansî û Îtaliyan di Siwêre de nebe @!.

Di çerxa cîhangeriyê de , em. xwe û gelên cîhanê yên serdest û xwedî dewlet bi ber hevdûdin û rabeî hev bikin.

Gelên serdest û xwedî dewlet li cîhanê bi ser ku, bi sedan sal li pêş me ne , ew hewldidin ku, kesayetî , çand , gerdîş û zimanê xwe biparêzin . Wek nimûne :

-Ebdela pêşew di mijareke xwe de dibêje :

1- Min çiqas hewil fikir ku, ez bi nivîskarên Estonî û Beltîqî re bi zimanê Rûsî baxêvim ; ew ji peyvandina bi zimanê Rûsî direvîn .

2- Siwêdî 6% ji niştîmanwarên Filnende ne ,Otonomiyek wan , ala wan, Perleman û distûrek wan î navçeyî heye û têkildariyên bi derve re hene . Ji bilî wê , leşkeriyê Jî Filnende re nakin û zimanê wan li tevaya Filnen de , zimanekî fermî ye . Lê, tucarî tu yekî Siwêdî nabînin ku, bi yekî dinî Siwêdî re – xwedê neke - yan bi zarokê xwe re bi Filnendî dipeyive , yan jî wan dişîne dibistaneke Filnendî.

Li gel herdu nimûneyên jorin , pîraniya gelên serdest yên xwedî dewlet jî mîna Erebi, Turk û Faris , ji wendabûna zimanê xwe bi tirs in û hewl didin ku ,biparêzin .

Lê, em Kurdên bêçare û belengaz , yên ku, ji hemî aliyên ve , li ber gef û gurên serdestên paşdemayî derin û tîn - ewên ku , navên me, welat û gundên me diguhêrin , ziman. me qedexe dikin û hebûna me tune dikin - ji dêvla em ji gelên serdest bêtir , çand û zimanê xwe biparêzin , em bervajî wan dixebitin →